Folkpartiet: Partiya liberal a Swêdê ye

Information & Fakta

Folkpartiet partiya liberal a Swêdê e. Îdeolojiya me liberalizm, li ser bingeha pêkanina daxwazên hemû kesan ava dibe. Ê her mirovî alikî wî yê şexsi heye. Armanca politikaya Folkpartiet ew e ku: Herkes azad be, herkes ew jiyana ku di mejiyê xwe de ji xwe re hilçinandiye pêkbine. Em baweriya xwe bi têgihiştin û wicdana mirovan tînin.

Pêşeroja me
Hilbijartina îsal naveroka pêşerojê Swêdê pêktîne. Pêwistiya Swêdê bi reqabetê û bawerkirina pêşerojê heye. Politikayê partiya me li ser bingeha van sê bejêyan dikare were zanîn. Zanyarî - Xebat - Ewlekarî. Ev tişt dê nîşan bike ku çawa em dixwazin Swêd di reqabeta global de serkewtî be.

Zaniyarî
Em dixwazin zaniyarî li welêt were bipêşxistin. Ji bo wê em dixwazin hîn ji dibistana destpêkê de garantiya xwendin, nivîsandin û jimartinê pêkwere. Giraniyê bidin ser zaniyariyê û xwendinê. Zûtir destbidayina qarneya zarokan bikin. Ji bo di dibistanan de dijî bitenyahiştina zarokan, pevçûn û lêxistina zarokan bê sekinandin, em dixwazin ji mamosteyên dibistanan re selahiyeta mezin were dayin û ji wan re rêça pêkanina pergal û rêzê were nîşankirin. Em dixwazin rê li ber xwendina bilind û vejandinê vekin.

Xebat
Bi riya pêşxistina zaniyarî dê rê ji bo avakirina kargehan, şirketên şexsî vebe û ew dê bi xwe re mecala zêdekirina cîhê xebatê veke. Gelek kes dê bixwazin cîhê kargehên xwe vekin. Ji bo wî jî astengiyên ku rê li ber vekirina kargehên şexsi hene, divê werin rakirin û rê hêsan be. Ji wan astengiyan yek jî bêşdayina ji bo dewletê, bilind e. Divê bêşdayin were kêmkirin ku ev tişt dê bibe hoya teşwika karkirinê. Bi wî hawayî karkirin li vî welatî şûna alikari kirina sazimanê bigire, karkerên kêmhatinî bikaribe bi hêsanî kar bike û jiyana xwe bidomînin.

Ewlekarî
Bi riyên kargehên şexsi, berhemên karên ku çêdibin dê pirtir ewlekar bibin. Wexta jî cîhên karan pirtir beş here bo dewletê, dewlet dê bikaribe ji beşê tenduristî û pîran baştir binêre. Ji bo nexweşiyê di dorê de mayin dê çareser be, rewşa tendurustî dê baştir bibe: Mirov bi xwe dê bikaribe doxtorê xwe û nexweşxaneya xwe hilçine. Hemû pîrên welatê me ji xwe û ji rewşa xwe bêtirs bibin. Ew kesên pîr ku nikaribin di cîhê xaniyên pîran de cîh bigire, divê bikaribin heqê kesên ku werin li malê xizmeta wan bikin, bigirin. Ewlekarî beranberê suçkirinê were xurtkirin. Hejmarên polisan divê bête zêde kirin. Ji bo mudaxalekirina sûcan, merc û detura polisan divê zêdetir û bi hukum be.

Integration (lihevguncîn)
Li Swêdê piraniya civatê bi hoya neteweyê biyanî yan ji bi hoya milletên cûda nikare di civata kar a Swêdê de cîh bigirin û li dervayî civata kar dimînin. Li dervî civatmayin û durmayina civatê ên mirovan roj bi roj bilindtir dibe. Em dixwazin rê bi vî bigirin bi hawakî xurt dijî hevbiçûkdîtina mirovan xebat bikin ji bo vî tiştî kaliteyê dibistanan bilind bikin, cihê kargehan vekin bi van riyan pergala civatê a ewlekariyê pêkbinîn, lihevguncînê bixin jîyanê. Swêdekî lihevguncîyayî ava bikin. Em, ew kesên liberal divê dijî cawaziya mirovan têkoşina xwe xurt bikin, vê nêrîna lihevguncîn û ewlekariya li cîhên kar û xebatan pêk binîn. Da kû ev ji herkesî re garantiya ewlekarîyê bide. Li dibistanan garantiya zaniyariyê pêkwere. Dibistan cîhê pêşvebirina zimên e. Dema dijî cawaziya mirovan bi xurti xebat were meşandin hejmarên qereqolên polisan ên xefer sê qat werin zêdekirin dê da ku bi xwe re garantiya ewletiyê bine. Ji ber ku dibistan ji bo kesên biyanî giring e, ên ku bixwazin bibin hemwelatiyên Swêdê divê zimanê Swêdî bizanibin.

Leşkerên cîhanî (global)
Folkpartiet Partiyekê internasyonalist e. Em piştgiriya globalî dikin. Em dixwazin EU yeki xurt bibînin. EU a ku ji derheqê serêşên cîranan têt û pirsgirekên cihanî çareser bike. Em dixwazin ticareta serbest pêşbikeve û destûrê wan were dayin. Aşitî dê bi riya hevkarî û tegihiştina baş pêkwere. Ew pir giring e ku politikayeke aktîv ji bo derveyî welêt a Swêdê, hebe. Em ê li ber çavsoriyan bêdeng nemînin. Piştgirtiya demokrasiyê bikin. Ji bo heqên mirovatî xebatkirin dê bibe parçekî xebata me a desturî.

Wekhevî
Wekhevî divê hîn pirtir û kûrtir be. Îro rewşa jinan û mêran ne wek hev in. Şanşê wan cûdaye. Di 12 salên dawî de heqên maaşê jinan û mêran her wek xwe maye û guhertinek çênebûye ev ne tişteki maqûl e.

Folkpartiet
www.folkpartiet.se
020-53 53 53